# Hûn Bi Xêr Hatin

## ÎZMÎRÊ

İZMİR
METROPOLITAN
MUNICIPALITY

RÊBERÊ BAJÊR

**Bi Xêr Hatî ÎZMÎRÊ, Rêberê Bajêr**

**AMADE KIRIN RÊBERÊ BAJÊR:**

**Şaredariya Bajarê Mezin A Îzmîrê Edaleta Bajêr U Wekhevî Midûriyeta Şaxê Tîma Beşa Penaberan.**

**SÊWIRÎNER:**

**Fikriye YELTETİK**
**Melis OMAY VURAL**

**AFİRÎNERÊN WÊNE:**

**Ethem Onur BİLGİÇ**
**Kürşat ÜNSAL**

**Cotmeh 2021**

*Ev weşan bi piştgiriya UNHCRyê ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê ve hatiye amadekirin. Hemû mafên vê weşanê yên Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê ne. Şîrove an jî nêrînên ku di vê xebatê de hatine bilêvkirin ne yên UNHCRyê ne.*





## Ji Şaredarê Me

Îzmîr, ji ber erdnîgariya wê, potansiyela wê ya bazirganiyê û guncavbûna mercên wê yên jiyanê ji dîrokê heta îro ji bo gelek kesan bûye warê koçê, him ji hundir him ji derve gelek kesan koçî wê kiriye , di warê dîrokî û civakî de bûye cihekî xwediyê mîrateyeke xurt.

Ji ber vê taybetmendiya Îzmîrê; vê derê ji gelek çandên cuda re malxweyî kiriye û vê yekê ev bajar ne tenê di warê aboriyê de, di warê civakî û çandî de jî dewlemend kiriye. Lewra nasnameyên cuda, ramanên cuda jî bi xwe re tînin. Ramanên cuda jî; hevguhdarîkirin û hevfêmkirinê, rêzgirtina ji hev re û çanda pêkvejiyana bi avakirina nirxên hevpar dewlemend dike.

Îzmîr, ji doh heta îro, nirxên Rojhilat û Rojava anîne cem hev û wek dilekî ye ku ji van nirxan re şert û mercên jiyanê pêk anîne. Bajarek e ku çandên cuda bi hev ve dikelijin û bi hev ve dibin yek û li ser vê bingehê nirxên nû, ramanên nû ava dibin. Ji ber vê sedemê ye demokrasiya ku di cîhanê de yek ji înovasyonên herî giranbuha ye, li ser vê axê zîl daye û li hemû cîhanê belav bûye.

Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê, ji dîroka qedîm a Îzmîrê referans digire û ji bo li bajarê me demokrasî û hestên jiyana hevpar xurttir bibin, bi feraseta rêvebiriyeke demokratîk tevdigere. Ji ber vê yekê kesên nû tên bajarê me, nasnameya wan çi dibe bila bibe; ji bo bi hêsanî tevlî jiyana Îzmîrê bibin, ji bo bikaribin ji hemû xizmetan sûdê werbigirin û ji bo xwe wek parçeyekî Îzmîrê bibînin, çi ji destê me tê em dikin.

Kesên ji bo serîlêdana penaberiyê tên welatê me û li bajarê me îkame dibin û em ji wan re malxweyiyê dikin, ev hem li gor mafên gerdûnî yên mirovan, hem jî li gor zagona bi hejmara 5393an a şaredariyan, yek ji berpirsiyariyên me yên bingehîn e. Li gor zagona şaredariyan,  kesek li kîjan bajarî îkame bike dibe hemşehriyê wê derê. Em, li vî bajarê me yê ku em bi we re parve dikin, ji bo jiyana bi hev re û bimirovane, girîngiya rêvebiriya li gor mafê bajar baş dizanin. Em bawer dikin ku yek ji şertên hizûra civakî ew e ku hemû kesên li bajarê me dijîn, bikaribin bigihîjin xizmetên bingehîn, bi awayekî wekhev bikaribin tevlî pêvajoya biryaran bibin û bikaribin maf û azadiyên xwe bi dest bixin.

Em binavkirinên wek; “penaber”, “koçber” û “multecî” ji bo wan kesên ku malên xwe li pey xwe hiştine û hatine û li vê derê dest bi jiyaneke nû kirine munasib nabînin û ev binavkirin  rastiya van mirovan û nasnameya wan a rastî pênase nake. Lewma jî hemû kesên ku tên Îzmîrê, em wan ji van pênaseyan cuda, wek Îzmîriyan dibînin.

Ez hêvîdar im ku hûn jî bi van hestan xwe wek parçeyekî vî bajarî bibînin; bi hebûna xwe, bi çanda xwe û bi ramanên xwe alîkariyê bidin pirdengî, pirrengiya nasnameyan û çanda jiyana biratiyê ya Îzmîrê.

Ev pirtûkoka di destê we de, bi temamî bi vê helwestê hatiye amadekirin ku; tê de behsa jiyana li Îzmîrê tê kirin; herwiha di pirtûkokê de xizmetên Şaredariya me ya Bajarê Mezin cih digrin û ji perwerdeyê ta tenduristiyê, ji destûra xebatê heta alîkariya edlî hemû mafên we û saziyên ku hûn dikarin destekê jê bigirin tê de hene. Ev wek rêbera bajêr hatiye amadekirin.

Wek rêvebirê vî bajarî ez dixwazim hûn bizanibin ku; ji bo hûn di jiyana xwe ya nû ya bajarê Îzmîrê de astengiyan nekşînin û ji bo hûn bikaribin ji hemû xizmetan sûdê werbigirin, çi ji destê min bê ez ê pêk bînim. Ez dîsa dibêjim hûn bi xêr hatin Îzmîra me, ser seran ser çavan; ji dil û can silav û rêz û hezkirinên xwe pêşkêş dikim.

**Mûstafa Tûnç SOYER**

Şaredarê Bajarê Mezin ê Îzmîrê

***Di vê rêberê de, bi gotina 'penaber', qesta kesên xwedî serîlêdan û statuya parastina navneteweyî, sûdmendên parastina demkî an jî kesên ku ditirsin ji ber ol, nîjad, meşreb, fikra wan a siyasî û aîdiyeta wan a komekê tiştek bê sere wan û lewma nikarin vegerin welatên xwe hatiye kirin.***

*Hûn dikarin kodên QR-yê yên di beşên têkildar de bi telefona xwe skan bikin û li ser mijarê agahiyên berfirehtir bigirin.

# NAVEROK


Ji Şaredarê Me

*BEŞ 1*

**JÎYAN LI ÎZMÎRÊ**

- Îzmîr 10
- Hin Mekanên Dîrokî û Qadên Kesk ên Îzmîrê 11
- Xizmetên Ragihandinê 16
- Li Bajêr Karûbarên Abonetiyê 21

*BEŞ 2*

**XIZMETGUZARIYÊN ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A ÎZMÎRÊ**

- Navenda Ragihandinê ya Hemşehrî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê (NRH) 28
- Alîkariyên Civakî 29
- Projeyên Civakî 31
- Xizmetên ji bo Jinan 31
- Navendên ji bo Zarok û Ciwanan 33
- Xizmetên ji bo Astengdaran 36
- Kursên Fêrkirina Pîşeyan 37
- Midûriyeta Şaxa Edalet û Wekheviya Bajarî 38
- Xizmetên Rewşa Lezgîn 38
- Xizmetên Tenduristiya Civakî 39
- Xebatên Werziş û Ciwanan 39
- Pirtûkxane 41
- Xizmetên Cenazeyan 43
- Xizmetên Dermankirinê û Têkoşîna bi Kurmûkêzan re 43
- Xizmetên Beytariyê 44

*BEŞ 3*

**MAFÊN PENABERAN, BINBARÎTIYA WAN Û SAZIYÊN PÊWENDÎDAR**

- Qeyd 48
- Alîkariyên Civakî & Xizmetên Civakî 53
- Perwerde 57
- Tenduristî 60
- Destûra Xebatê 62
- Alîkariya Dadî, E-dewlet, Serîlêdanên Koda HES'ê 65
- Saziyên Sivîl ên Civakî yên ku li Îzmîrê Xizmetê Didin Penaberan 67

*BEŞ 4*

**ROJ Û TELEFONÊN GIRÎNG**

- Roj û Cejnên Girîng 74
- Telefonên Girîng 74

BEŞA 1

# JÎYAN LI ÎZMÎRÊ

# - Îzmîr



Îzmîr bajarekî bêndera behrê ye û ew deriyê Tirkiyê ye ku li rojava vedibe. Bi îqlima xwe, bi xwezaya xwe ya bêhempa û bi dîroka xwe ya 8500 salî Îzmîr, yek ji bajarên herî xweşik ên hewzaya Deryaya Spî ye. Ji dîrokê heta îro bûye warek ku şaristan lê civiyane, bi sedsalan bûye qada bazirganî, çand û hunerê, rojava û rojhilat li ser vê axê bi ahengeke xweş bûne yek. Ev dewlemendiya dîrokî ya Îzmîrê û pêkvejiyana çandî ya li bajêr îro jî xwe nîşan dide.



# - Hin Mekanên Dîrokî û Qadên Kesk ên Îzmîrê

## Girikê Tepekûleyê (Bayrakli)

Li vê derê, jêmayîyên B.Z. 3000 salî cih digirin, ji ber vê yekê tê fehmkirin ku avabûna Îzmîrê digihîje heta wan salan.

## Kadîfekale


Di çavkaniyên dîrokî de tê gotin ku Alexandrosê Makendonyayî ku di zimanê Tirkî de wek “Büyük İskender” tê binavkirin, B.Î. di sala 334an de Împaratoriya Persan têk dibe, tê derdora Îzmîrê û li herêma Kadîfekaleya niha bi navê Smyrna bajarekî nû ava dike.

## Agora

Agoraya li navenda bajêr, li taxa Basmaneyê, ji B.Z. sedsala II. ve maye û ji jêmayiyên dema Romayê ye.


## Xana Kizlaragasiyê

Ev xan di sala 1744an de hatiye avakirin. Li Îzmîrê xana herî balkêş e û mînaka herî delal a mîmariya Osmaniyan e. Niha bi qehwepêjên xwe balê dikişîne.




## Qada Konaxê û Birca Saetê

Di dema Osmaniyan de di sedsala 19. de, dema Qesra Hikûmetê hat vekirin ev qad jî ava bû. Yek ji sembolên Îzmîrê jî Barûya Saetê ya Konaxê, di sala 1901ê de, bi minasebeta 25. salvegera derketina ser text a Sultan Evdilhemîdê II. hatiye avakirin.



## Asansor

Ev avahiya ku li Karataşê ye, di sala 1907an de, ji aliyê karmendê cihû yê Îzmîrî Nesîm Levî ve, ji bo ku şênîyê bajêr ji kolana Mîthetpaşa bikaribin derbasî kolana Halîl Rifat Paşayê bibin hatiye çêkirin.



## Li van qadên kesk ên Îzmîrê jî mirov dikare demên xwe bi awayekî xweş bibuhurîne:

- Qada Fûarê ya Kulturparkê
- Daristana Bajêr a Încîraltiyê
- Parka Jiyana Xwezayî ya Sasaliyê
- Bihuşta Çûkan
- Gola Reş
- Qada Rekreasyonê ya Aşik Veyselê ya Bornovayê
- Daristana Terapiyê ya Balçovayê
- Zozanê Kozakê ya Bergamayê
- Zozanê Ovacikê yê Kemalpaşayê
- Kemalpaşa Nazarkoy, Derekoy, Taxên
- Jêrîn ên Kizilcayê
- Taxa Bozdaxê ya Odemîşê
- Zozanê Golcîkê ya Odemîşê
- Taxa Bîrgiyê ya Odemîşê
- Bazara Sêşemê ya Tîreyê
- Gundê Qaplanê yê Tîreyê
- Çiyayên Kizil ên Seferîhîsarê (Godence, Golcuk, Çamlik, Efemçûkûrû)
- Gundê Karabaxlarê yê Kavacikê

**Di derheqê dîroka Îzmîrê de, di derheqê qadên turîstîk ên geryanê de, hûn dikarin agahiyên berfirehtir, li jêr ji pêveka lînkê û nimreya telefonan bistînin:**
**www.izmir.bel.tr/tr/Yayin/145/225#dergi/sayfa1**

**Midûriyeta Çand û Turîzmê ya Bajarê Îzmîrê:**
(0232) 483 62 16-482 51 17

**Midûriyeta Şêwirmendiyê ya Turîzmê:**
(0232) 484 21 47

**Buroya Navenda Şêwirmendiya Turîzmê:**
(0232) 445 73 90

## Li Îzmîrê Mekanên Çand û Hunerê

**Ji bo festîval û çalakiyan hûn dikarin ji vê lînkê agahiyan bistînin**
**www.kultursanat.izmir.bel.tr/**

### NAVENDA HUNERÊ YA AHMED ADNAN SAYGUNÊ (AHMED ADNAN SAYGUN SANAT MERKEZİ)

Tel: 0232 293 38 00
Nanvîşan: Mithatpaşa Caddesi
No: 1087 Güzelyalı
www.aassm.org.tr

### HUNER ÎZMÎR (İZMİR SANAT)

Tel: 0232 293 40 49
Nanvîşan: Kulturpark Fuar Alanı
26 Ağustos Kapısı yakını
www.izmirsanat.org.tr

### NAVENDA ÇAND Û HUNERÊ YA ÎSMET ÎNONUYÊ (İSMET İNÖNÜ KÜLTÜR SANAT MERKEZİ)

Tel: 02323 293 40 49
Nanvîşan: Kültürpark Fuar Alanı Lozan Kapısı yakını

### ŞANOYA SERVEKIRÎ YA FÛARÊ YA ATATURKÊ (ATATÜRK FUAR AÇIKHAVA TİYATROSU)

Tel: 0232 293 40 49
Nanvîşan: Kültürpark Fuar Alanı

### GALERIYA HUNERÊ YA ÇETÎN EMEÇÊ (ÇETİN EMEÇ SANAT GALERİSİ)

Tel: 0232 293 40 49
Nanvîşan: 900 Sokak
No:17 Hisarönü

### TIYATROYA AMFÎ YA AŞIK VEYSEL A BORNOVAYÊ (BORNOVA AŞIK VEYSEL AMFİ TİYATRO)

Tel: 0232 293 19 61

### FABRÎQEYA DÎROKÎ YA GAZÊ YA KAMPUSA CIWANAN (TARİHİ HAVAGAZI FABRİKASI GENÇLİK YERLEŞKESİ)

Tel: 0232 293 34 24
0232 293 17 21

### ŞANOYA SERVEKIRÎ YA ÎNCÎRALTIYÊ (İNCİRALTI AÇIKHAVA TİYATROSU)

Tel: 0232 293 40 49
Nanvîşan: Haydar Aliyev Bulvarı
İnciraltı/Balçova

## WizmirNET

Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê, li gelek qadên bajêr ên hevpar, xizmeta înterneta bêqablo dide gelê bajêr. Hin ji van qadan ev in: **Meydana Gundoxduyê, Meydana Kulturparkê (Fûar), Pasaport, Qada Rekreasyonê ya Aşik Veysel, Fabrîqeya Dîrokî ya Gazê, Rawestgeha Metroyê ya Halkapinarê, Kompleksa Werzîşê ya Hasanaxayê ya Bûcayê, Navenda Astengdaran a Încîraltiyê, Parka Ataturkê ya Çamdîbiyê û otobusên ESHOT'ê.**





### Girêdana WizmirNET'ê jî pir hêsan e:

Wî-Fî'ya telefona destan, tablet an jî kompîtûrê vekin, ji vebijêrkan **"WizmirNET"** hilbijêrin. Paşê, dema ku rûpela înternetê vebû, rûpela Têketinê dê li ber we vebe, ji wir pê li bûtona "Kayıt Ol"ê bikin û agahiyên bên xwestin (Nimreya telefonê û hwd.) binivîsin, şîfreya ku wek peyam hat li cihê ku tê xwestin binivîsin û dest bi bikaranîna înternetê bikin.


# - Xizmetên Ragihandinê

## Nexşerêyên Tevnên Ragihandinê Yên Îzmîrê

https://www.eshot.gov.tr/tr/izmir-ulasim-haritalari/146/452







HATUNDERE
MENEMEN
EGEKENT-2
ULUKENT
EGEKENT
ATA SANAYİ
ÇİĞLİ
MAVİŞEHİR
ŞEMİKLER
DEMİRKÖPRÜ
NERGİZ
KARŞIYAKA
ALAYBEY
NALDÖKEN
ATAŞEHİR
ÇEVRE YOLU
MAVİŞEHİR
BİLİM MÜZESİ
ATAKENT
SELÇUK YAŞAR
VİLAYET EVİ
ÇARŞI
BOSTANLI İSKELE
YUNUSLAR
NİKAH SARAYI
KARŞIYAKA İSKELE
TURAN
BAYRAKLI
SALHANE
BORNOVA MERKEZ
EVKA-3
ALSANCAK GAR
HAVAGAZI
ATATÜRK SPOR SALONU
ALSANCAK STADYUM
HOCAZADE CAMİİ
ÜNİVERSİTE
SANAYİ
BÖLGE
BORNOVA HASTANE
EGE ÜNİVERSİTESİ
STADYUM
KONAK İSKELE
GAZİ BULVARI
KÜLTÜR PARK ATATÜRK LİSESİ
KARATAŞ
ÇANKAYA
BASMANE
HALKAPINAR
ÜÇKUYULAR
GÜZELYALI
SADIKBEY
KONAK
HİLAL
FAHRETTİN ALTAY
AASSM
GÖZTEPE
KÖPRÜ
KARANTİNA
ZAFERTEPE
BALÇOVA
FAHRETTİN ALTAY
POLİGON
GÖZTEPE
HATAY
İZMİRSPOR
ÜÇYOL
KEMER
ŞİRİNYER
BOZYAKA
GENERAL ASIM GÜNDÜZ
BUCA BELEDİYE
KASAPLAR MEYDANI
HASANAĞA PARKI
KOŞU
İNKILAP
D.E.Ü. TINAZTEPE KAMPÜSÜ
SEMT GARAJI
ESBAŞ
BUCA KOOP.
GAZİEMİR
ÇAMLIKULE
SARNIÇ
ADNAN MENDERES HAVALİMANI
CUMAOVASI
DEVELİ
TEKELİ
PANCAR
KUŞÇUBURUN
TORBALI
TEPEKÖY
SAĞLIK
BELEVİ
SELÇUK
Metro Hattı • Narlıdere Metro Line
ro Hattı • Buca Metro Line
ornova Merkez Hattı • Evka 3 - Bornova Center Line
vay Hattı • Çiğli Tram Line
Hattı • Bergama Line
nderes - Stadyum Metro Hattı • Adnan Menderes - Stadyum Metro Line

Li Îzmîrê ji bo mirov bikaribe li wesayîdên ragihandina komguhêz ên wek; otobus, keştî, tramway, metro û ÎZBAN'ê siwar bibe, divê ÎZMÎRKART'a mirov hebe û divê bi qasî heqê çûnûhatina ragihandinê pere tê de hebe. Li ser makîneyên li rawestgehên metroyan, li îskeleyên keştiyan û li rawestgehên ÎZBAN'ê, li hinek bufeyan û bi karta krêdiyê li ser navnîşana **izmirimkart.com.tr**'ê mirov dikare pere li ÎZMÎRKART'ê bar bike.

Kesên xwendevan an dikarin li ser navnîşana; izmirimkart.com.tr'ê rûpela Serîladana Pêşîn a Karta bitikînin û serîlêdana karta ya ji bo xwendevanan an jî dikarin ji navendên li jêr nivîsandî ew bi xwe serî lê bidin:

- Midûriyeta Şaxa Kartên Elektronîk a Konakê
- Navenda Serîlêdana Kartan a Fahrettîn Altayê (Navenda Veguhestinê ya Fahrettîn Altayê)
- Navenda Serîlêdana Kartan a Bostanliyê (Rawestgeha Veguhestinê ya Bostanliyê)
- Navenda Serîlêdana Kartan a Otoparka Biqat a Konakê (Binê Otoparka Biqat a Konakê)

Ji 1ê Îlona 2020an şûn de, heke mirov di nava 120 deqeyî de li wesayîda komguhêz a duyemîn siwar bibe, bikaranînên din bê pere ne.



Heta ku tevdîrên COVID-19'ê bi dawî bibin, divê her kes bi rûpoş li wesayîdên ragihandina komguhêz siwar bibe. Digel vê yekê, divê İZMİRİMKART bi koda HES'ê bê hevcotkirin ku ew kod divê takekesî be û herî kêm ji bo 6 mehan hatibe sitendin. (Ji bo agahdariya berfirehtir a li ser koda HES'ê ji kerema xwe li Beşa 3. binêrin).

# Ragihandina bi Duçerxeyê



***Pergala Kirêkirina Duçerxeyê ya Smart***

**Ji cihên Pergala Kirêkirina Duçerxeyê ya Smart (BİSİM),** hûn dikarin bi karta krediyê û bi İZMİRİMKART'ê duçerxeyê kirê bikin. Ji bo agahiyên rojane yên di derheqê karta BİSİM'ê de hûn dikarin li vê malperê **http://www.bisim.com.tr/** binêrin.

Şaredariya Bajarê Mezin ê Îzmîrê, ji bo piştgiriya bikaranîna duçerxeyan biryarek girt. Li gor vê biryarê, kesên ku duçerxeyan bi kar bînin, dema bi duçerxeya xwe li keştî û ferîbotan siwar bibin, dê heqê çûnûhatinê bi erzanî bidin.

Ji bo saet û xetên ragihandinê yên Îzmîrê û nûçeyên din ên di derbarê Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê de, sepanên İzmir Büyükşehir Belediyesi, İZUM û ESHOT'ê li telefona xwe bar bikin û bitikînin.

# Tabloya Ragihandinê ya Îzmîrê

| SAZÎ | AGAHÎ | PÊWENDÎ |
|---|---|---|
| ESHOT | Xetên Otobusan<br>Saetên Otobusan<br>Daxuyaniyên Rojane<br>İZMİRİMKART | ***www.eshot.gov.tr*** |
| ÎZDENÎZ | Xetên Keştiyan<br>Saetên Keştiyan<br>Daxuyaniyên Rojane | ***www.izdeniz.com.tr*** |
| METRO ÎZMÎR | Xetên Metroyê<br>Saetên Seferên Metroyê<br>Daxuyaniyên Rojane | ***www.izmirmetro.com.tr*** |
| TRAM ÎZMÎR | Xetên Tramvayê<br>Seferên Tramvayê<br>Daxuyaniyên Rojane | ***www.tramizmir.com*** |
| ÎZUM | Rewşa Trafîkê û herîkbariya wê<br>Qeza û Xebatên rêçêkirinê<br>Kamerayên Bajêr<br>Otopark<br>Rewşa Hewayê<br>Dermanxane | ***izum.izmir.bel.tr/index*** |



# - Li Bajêr Karûbarên Abonetiyê

## Elektrîk

Li Îzmîrê elektrîk ji aliyê Gedîz Elektrîk A.Ş.'yê ve tê belavkirin. Ji bo karûbarên abonetiyê yên wek abonetiya nû ya ji bo avahiyan , dewrkirina abonetiyê, lêvegerandina berdêla ewlehiyê, lêpirsîna berdêla ewlehiyê ya rojane hûn dikarin biçin Navenda Pêwendiyên Muşteriyan a Gedîz Elektrîkê (MÎM) an jî telefonî nimreya 0850 800 0 186'ê bikin. Digel vê yekê hûn dikarin li ser e-devletê serîlêdana abonetiya takekesî, serîlêdana fesihkirina abonetiya takekesî, lêpirsîna deynan û lêpirsîna agahiyên deyndayînê bikin. Beriya hûn biçin Gedîz Elektrîk MÎM'ê hûn dikarin ji vê malperê randevûyê bistînin **randevu.gediz.com** Di dema têketina navendan de koda HES'ê tê xwestin.

**Ji bo abonetiya elektrîka avahiyê, belgeyên ku divê bên teslîmkirin ev in:**

**1.** Nimreya tesîsata ku ew ê abonetî li serê çêbibe,
**2.** Forma Serîlêdana Peymana Îmzekirî ya Firotana Perkende,
**3.** Nasnameya Eslî,
**4.** Polîçe an jî nimreya polîçeya ku ji Saziya Sîgortayên Afetên Xwezayî (DASK)'ê hatiye girtin,
**5.** Mezêxer, heke li şûna peymana heyî ya firotana perkende ya ku bidawî nebûye, bi daxwaza dewirkirinê, serîlêdana peymana firotana perkende bike, wê gavê şîrket dikare ji mezêxer belgeya ku wê avahiyê bi kar tîne bixwaze. (Kontrata kirê, ji bo saziyên fermî belgeya tehsîsa lojmanê, tapo, fatûreya avê, fatûreya gaza xwezayî, fatûreya înternetê)

## Av

Li Îzmîrê abonetiyên avê ji aliyê İZSU'yê ve tên çêkirin. Dema maleke nû tê kirêkirin an jî dema navê abonetiya malê bê guhertin, gavên ku divê bên şopandin, belgeyên pêwîst û bihayên ku divê bên dayîn wiha ne:

**Karûbarên Hewce:**

**1.** Serîlêdana Midûriyeta Şaxê ya Serokatiya Daîreya Karên Abonetiyê divê bê kirin.
**2.** Daxwaznameya ku ji pergalê bê stendin divê bê îmzekirin.
**3.** Berdêla Temînatê û heke hebe deynê peymana berê divê bê dayîn.
**4.** Peymana nû tê îmzekirin û guhertina navê abonetiyê tê kirin.

**Belge û Agahiyên ku Tên Xwestin**

**1.** Daxwazname (Di dema serîlêdanê de ji aliyê İZSU'yê ve tê amadekirin)
**2.** Belgeya ku Nimreya Nasnameya K.T. lê heye (Pasaport, Nasnameya Nufûsê an jî Belgeya Ajokariyê) Heke abone bi xwe nikaribe serîlêdanê bike, wê demê belgenameya nûneriyê (Wekaletname)
**3.** Nimreya Polîçeya Sîgortaya Afata Xwezayî (DASK)

## Gaza Xwezayî

Bi serîlêdana navenda abonetiya GAZA SIRÛŞTÎ YA ÎZMÎR'ê, hûn dikarin karûbarên abonetiyê bidin destpêkirin. Ji bo kirêdaran peymana muşteriyê tê amadekirin. Ji bo vê peymanê belgeyên ku tên xwestin û xisûsiyetên ku mirov divê lê baldar be wiha ne:

**1.** Fotokopiya Kontrata Kirêdariyê, Belgenameya Îkameyê an jî fatûreya Elektrîkê – Avê (Ev fatûre divê li ser navê kesê ku peymanê çêbike be)
**2.** Fotokopiya nasnameyê ya kesê ku peymanê çêdike.
**3.** Nimreya aboneyê – hesab

Heke li ser navê kesê xwedî maf, takekes/fîrmayeke din karûbarên girêdana abonetiyê û peymana muşterî bide çêkirin, divê wekaletname û fotokopiya nasnameya kesê wekîl bê diyarkirin.

Piştî karûbarên girêdana abonetiyê, li pey karûbarên peymana muşterî, divê fermana heqdayîna otomatîk a bankayê bê rojanekirin.

**Hûn dikarin ji vê lînkê xwe bigihînin navenda abonetiya GAZA SIRÛŞTÎ YA ÎZMÎR'ê:**
**http://www.izmirgaz.com.tr/tr/Abonelik-Hizmetleri/Abonelik-Hizmetleri-Genel-/Abone-Merkezleri.html**

## Di Dema Kirêkirina Malê de Xalên Ku Divê Hûn Baldar Bin

- Li Tirkiyê ji bo kirêkirina malê divê nasnameyeke derbasbar hebe.
- Ji bo kirêkirina malê divê di navbera xwediyê malê û kesê ku dixwaze kirê bike de, Peymana Kirêkirinê (Kontrat) bê amadekirin. Ev peyman bi devkî an jî bi nivîskî dibe lêbelê, ji bo ku ewle be, peymana kirêkirinê nivîskî be dê çêtir be.
- Di peymanê de divê agahiyên kesê malê kirê dike û navnîşana mala ku tê kirêkirin bê kêmasî bên nivîsandin. Di peymanê de berdêla kirê, dîroka destpêka kirê, dema peymanê û şiklê dayîna heqê kirê (bi rêya bankê û hwd.), rewşa heyî ya mala ku tê kirêkirin û berdêla depozîtoyê divê bi baldarî bên destnîşankirin. Her rûpela peymanê divê ji aliyê her dû terefan ve were îmzekirin. Nusxeyek peymanê divê li cem kesê ku malê kirê dike, nusxeya din jî li cem kesê ku malê kirê dide bimîne.
- Piştî peymana kirêkirinê hate îmzekirin, kesê malê kirê dike divê abonetiya malê ya elektrîkê, ya avê û heke hebe abonetiya gaza sirûştî bide ser navê xwe.

- Heke amûrên giran ên di malê de texrîb bûbin, mesrefa temîra wan divê xwediyê malê bide.
- Peymanên kirêkirinê, heke demekê ji bo wê nehatibe diyarkirin, bi piranî ji bo salekê tên amadekirin, di peymanê de divê mirov li dema wê baldar be. Rêjeya zêdekirina kirê, di peymanê de dikare bê diyarkirin. Lêbelê, heke di peymanê de zêdekirina rêjeya kirê hatibe diyarkirin jî, li gor Zagona 344. a Deynan a Tirkiyê, ev rêje divê ji rêjeya guherînê ya nîvekiya dozde mehan a kirêdariya sala çûyî ya li gor endeksa bihayê mezêxer(TÜFE)yê zêdetir nebe.
- Zêdekirina kirêyan, di dawiya demên ku di peymanê de hatiye nivîsandin de tê diyarkirin. Di nava demê de zêdekirina kirêyan çênabe.
- Heke xwediyê malê, beriya ku dema peymanê bi dawî bibe bixwaze kirêdar ji malê derxe, divê sedemeke derbasbar hebe.
- Ger kirêdar bixwaze malê vala bike divê 15 rojan beriya ku dema kontratê bi dawî bibe xeberê bide xwediyê malê. Heke beriya ku dema kontratê bi dawî bibe kirêdar ji malê derkeve, li gor kontratê heqê mehên mayî li ser wî dimîne.
- Di peymanên kirê yên diyarkirî de, heke 15 rojan beriya dîroka xilasbûna peymanê, ji bo betalkirinê agahdariyek neyê dayîn, peyman bi heman şertan saleke din jî dirêj dibe. Xwediyê xanî di van şert û mercan de nikare peymanê li gor muhletê betal bike.

## Bazarên Taxan

**https://www.izmir.bel.tr/tr/AcrdIcerik/3206/29**

li ser vê navnîşanê hûn dikarin navçe, roj û dîroka wan hîn bibin.



# Li Îzmîrê Qadên Civîna Rewşa Lezgîn û Afatê

Qadên civîna lezgîn û afatê, ew cih in ku piştî afat û rewşên lezgîn çêdibin (erdhej, şewat, lehî û hwd.) heta dema ku navendên demkî yên starê bên amadekirin, gel li wir tê civandin. Ev qad ji bo di vê demê de rê li ber panîkê bê girtin, ji bo danûstandina agahiyên rastî û ji bo gel ji herêmên xetere bê dûrkirin hatine amadekirin.

**Hûn dikarin ji lînka jêr lîsteya qadên civîna lezgîn ên li Îzmîrê, li gor navçeyan bibînin:**

**https://izmir.afad.gov.tr/izmir-toplanma-alanlari-merkezicerik**

BEŞA 2

# XIZMETGUZARIYÊN ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A ÎZMÎRÊ

# - Şaredariya Bajarê Mezin A Îzmîrê

**: Wateya vê nîşanê ew e ku li şaxa pêwendîdar piştgiriya bi zimanê Erebî tê dayîn.**

## Navenda Pêwendiya Hemşehrî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê (HİM)

Di bin banê Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê de, ji bo kesên li Îzmîrê dijîn û kesên serdana Îzmîrê dikin di derbarê xizmetên şaredariyê de bibin xwedî agahî, ji bo bizanibin dê çawa ji bo van xizmetan serî lêbidin, ji bo bikaribin di derheqê pirsgirêkên bajêr de perspektîfên xwe pêşkêş bikin (navnîşan, navê kuçeyan, navê taxan û hwd.), ji bo gazinên xwe bikaribin ragihînin navenda ragihandinê hatiye amadekirin. Navê vê navendê; Navenda Pêwendiya Hemşeriyan e, bi kurtasî HİM e.

**Bi rêya telefon, medyaya civakî, e-maîl an jî wek websîte li ser gelek kanalan hûn dikarin serîlêdana HİM'ê bikin:**

Navenda Bangê: **444 40 35**
Twitter: @izmirhim
E-mail: him@izmir.bel.tr
**https://him.izmir.bel.tr/**



## Platforma BîzÎzmîrê

Ev platfotmek dijîtal e û ji bo kesên ku li Îzmîrê dijîn di derbarê hemû çalakî, kampanyayên hevkariyê û xizmetên bajarê Îzmîrê de bibin xwedî agahî û di derheqê mijarên girîng de fikr û ramanên xwe parve bikin hatiye avakirin.



**www.bizizmir.com**

# - Alîkariyên Civakî

## Projeya Berxika Şîr:

Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê, şîrê ku ji kooperatîfên hilberînê dikire, ji bo zarokên ku temenê wan di navbera 1 û 5 salan de ye bê pere li malan belav dike. Ji bo mirov ji projeya Berxika Şîr sûdê werbigire, divê bi belgenameyên ku tên xwestin (dê, bav nasnameya zarokên temenê wan di navbera 1 û 5 salan de, navnîşan û hwd.) li şaxa Berxika Şîr miracat bike ku li jêr agahiyên wê hene:

**Nanvîşan 1**
Laleli Mahallesi Menderes Caddesi No:418,
Gürçeşme Zübeyde Hanım Huzurevi, Buca/İzmİr
Telefon: 444 40 35

**Nanvîşan 2**
Milli Kütüphane Cad. No:41/A
Z47 (Katlı otopark altı)
Konak/İZMİR

## Xizmeta Aşxaneyê

Di nava hefteyê de her roj nîvrokî, li kesên ku pêdiviya wan pê heye ji aliyê Şaxa Midûriyeta Aşxaneyan ve xwarina germ a ku personelên wan amade kirine tê belavkirin.

**Navnîşan**

1. Cîh: Güney Mahallesi 1150 Sokak No:36 Konak/İZMİR
2. Cîh: Mehmet Akif Mahallesi 2739 Sokak No:36/A Zemin Kat Konak/İZMİR
3. Cîh: Süvari Mahallesi 803 Sokak No:87 Konak/İZMİR
4. Cîh: Göksu Mahallesi 684/11 Sokak no:38/A Buca/İZMİR

## Alîkariya Erzaq

Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê, ji bo kesên ku pêdiviya wan pê heye alîjariya erzaq, ardû û sotemeniyê dike. Agahiyên berfireh ên derbarê alîkariyan de hûn dikarin ji **HİM'a Îzmîrê (444 40 35)** bistînin an jî ji van navnîşanên jêr serî li Midûriyeta Şaxa Alîkariyên Civakî bidin.

**Navnîşan 1**
Laleli Mah. Menderes Cad. No: 420 (Eski Zübeyde Hanım Huzurevi 2 No: 39) Gürçeşme Buca/İZMİR

**Navnîşan 1**
Milli Kütüphane Cad. No:41/A
Z47 (Katlı otopark altı)
Konak/İZMİR



## Mêvanxaneya Muyesser Tûrfanê ya Mêran a Demkî

Mêvanxaneya Muyesser Tûrfanê ya Mêran a Demkî li Ornekkoyê ye û di bin banê Midûriyeta Aramxaneyê ya girêdayî Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê de, salê 12 mehan li gor agahiyên ku ji çavkaniyên cuda tên, hemwelatiyên mêr ên ku temenê wan di navbera 18 û 60î de ye dihewîne, alîkariya xwarin û kincan li wan dike.

**Müyesser Turfan Geçici Erkek Konuk Evi**

7449 Sok. No:16 Zübeyde Hanım Mah. Örnekköy – Karşıyaka/ İZMİR

Tel: 0 (232) 361 71 51 (Heke mesaî qediya be, ji vê nimreya telefonê hûn dikarin bigihîjinê: 0232 361 00 82)

# Projeyên Civakî

# - Xizmetên ji bo Jinan

## Mifte - Navenda Xizmeta Hevgirtî ya Xebatên Jinan

Mifte, navendek e ku ji bo wekheviya zayendî ya civakî pêk were û çalakiyên bi vê mebestê bên meşandin hatiye avakirin. Ji xizmetên şêwirmendiyê, heta xizmetên kursên pîşeyî, kooperatîfgerî, perwerdeyên îstihdam û miteşebisiyê, xebatên sportîf û çandî, gelek xizmetan di bin sîwanekê de kom kiriye û bi vê rêyê dixwaze jin bi hêsanî bikaribin bigihîjin van xizmetan. Digel vê yekê li navendê; saziyên civakî yên sivîl ên di warê jinan de xebatan dimeşînin, semîner, civîn û perwerdeyên xwe û projeyên hevpar dikarin bimeşînin.



**Örnekköy Yerleşkesi**
Zübeyde Hanım Mahallesi
Başpehlivan Karaali Cad. No:377
Karşıyaka/ İZMİR
Tel: (0232) 293 91 48

## Navenda Şêwirmendiya Jinan

Di Navenda Şêwirmendiya Jinan a Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê de, tevî jinên ku rastî tundiyê hatine an jî rîska tundiyê li ser wan heye û jinên ku demkî û navneteweyî di bin parastinê de ne, ji bo hemû jinan desteka şêwirmendiya dadî û derûnî tê pêşkêşkirin. Ji bo jin bikaribin bigihîjin cihên alîkariyên civakî, rê tê nîşandan. Digel vê yekê, ji bo jin mafên xwe bizanibin û bihêz bibin perwerde û xebatên atolyeyê tên kirin.

**Navnîşan:** Çankaya Mahallesi 155 Sokak No: 18 Hatay Konak/İZMİR
Tel: 0 (232) 293 4293



## Stargeha Jinan

Li Stargeha Jinan; tevî jinên ku rastî cudakariyê û tundiyê hatine an jî di bin gefan de ne û keçikên temenê wan heta 18 salan e û kurikên ku temenê wan heta 12 salan e, li gor rewşa wan, ji bo demekê dimînin û pêdiviyên wan ên bingehîn li vir tên pêkanîn. Stargeha Jinan dixwaze van kesan bi hêz bike. Serîlêdana ji bo van malan li qerekola herî nêz, cendirme an jî bi rêya Navenda Şopandin û Pêşîlêgirtina Tundiyê(ŞÖNİM)ê tê kirin.

# - Xizmetên ji bo Zarok û Ciwanan

## Navendên Zarok û Ciwanan (ÇOGEM)

Ji bo zarokên ku temenê wan di navbera 7 û 14an de ye bikaribin li cihekî ewle xwe bi pêş ve bibin ev navend hatine avakirin. Li van navendan ji bo zarok, demên xwe yên derveyî dibistanê baş bi kar bînin, qabiliyetên xwe xurt bikin xebat tên kirin. Ji bo zarokan xizmetên piştgiriya perwerdeyê tên dayîn. Xebatên perwerdeya hunerî û ger û geryanên çandî tên organîzekirin. Ji bo kesan, ji bo malbat û koman xizmeta şêwirmendiya derûnî tê dayîn. Pê re jî ji bo berdewamiya pêşveçûna fîzyolojîk û psîko-sosyal a zarokan şêwirmendiya xizmeta sosyal tê dayîn. Ji bo berdewamiya perwerdeya zarokan û ji bo zarok ji nû ve vegerin dibistanê û bi dibistan û malbatên wan re xebatên hevkariyê û perwerdeyî tên meşandin.



**Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin li navnîşanên jêr binihêrin:**

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Gumuşpalayê** (Gümüşpala Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Gümüşpala Mah. 717 Sk. No:49 A-B Karşıyaka
  Pêwendî: (0232) 293 87 15-13

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Çîgliyê** (Çiğli Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  8715 Sok. Anadolu Cad. No:16 Küçükçiğli
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 71- 76

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Ûzûndereyê** (Uzundere Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Yaşar Kemal Mah. 6002 Sok. No:10/1 Uzundere/Karabağlar
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 82

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Bûcayê** (Buca Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  1263 Sok. Aydoğdu Mah. Sosyal Yaşam Kampüsü Buca Çocuk ve Gençlik Merkezi No:1/B Evka1/Buca
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 68–85

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Lîmontepeyê** (Limontepe Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Limontepe Mah. 9708 Sk. No:3 Karabağlar
  Pêwendî: 0 (232) 293 97 23

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Ornekkoyê** (Örnekköy Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Zübeyde Hanım Mah. Başpehlivan Karaali Cad. No:377 A blok 1.Kat Örnekköy/ Karşıyaka
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 65

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Torosê** (Toros Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Adalet Cad. No:66 Toros/Konak
  Pêwendî: (0 (232) 293 44 36

- **Navenda Zarok û Ciwanan a Guzelbahçeyê** (Güzelbahçe Çocuk ve Gençlik Merkezi)
  Atatürk Mah. Namık Kemal Cad. No:16/A
  Pêwendî: 0 (232) 293 97 67

## Malên Çîrokan

Malên Çîrokan, ji bo wan zarokan e ku temenê wan di navbera 36 û 53 mehî de ne. Li van malan li gor pêdivî û taybetmendiyên zarokan; xebatên çandî-civakî, atolyeyên jiyana bi xwezayê re, xebatên naskirin û fehmkirina mafên zarokan, koordînasyona bedenê, çalakiyên resman, hunerên destan û pêşxistina ziman û atolyeyên muzîkê tên pêşkêşkirin. Ji bo dayikan, xebatên fêrkirina pîşeyan, kursên qabiliyetê tên dayîn û xebatên komî yên ferqîniyê tên pêkanîn.

**Hûn dikarin agahiyên berfireh ji van navnîşanên jêr bistînin:**

- **Mala Çîrokan a Torosê**
  (Toros Masal Evi)
  Adalet Cad. No:66 Toros/Konak
  Pêwendî: 0 (232) 293 44 36
- **Mala Çîrokan a Bayrakliyê**
  (Bayraklı Masal Evi)
  Cengizhan Mah. 1620/39 sk.
  No:23/B Bayraklı
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 90
- **Mala Çîrokan a Kadîfekaleyê**
  (Kadifekale Masal Evi)
  Aziziye Mah. 717 Sk. No: 106A Konak/İZMİR
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 69
- **Mala Çîrokan a Tîreyê**
  (Tire Masal Evi)
  Kurtuluş Mahallesi İsmail Taşlı cd. No:34/A Tire
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 75
- **Mala Çîrokan a Bûcayê**
  (Buca Masal Evi)
  Buca Sosyal Kampüs Aydoğdu Mah.
  1263 sk. No:1B Evka1 Buca/İZMİR
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 87
- **Mala Çîrokan a Ornekkoyê**
  (Örnekköy Masal Evi)
  Zübeyde Hanım Mahallesi Başpehlivan
  Karaali Cad. No:377 A Blok Zemin Kat,
  Karşıyaka/İZMİR
  Pêwendî: 0 (232) 293 96 65
- **Mala Çîrokan a Gumuşpalayê**
  (Gümüşpala Masal Evi)
  Gümüşpala Mah. 717 Sk. No:49 A-B
  Karşıyaka
  Pêwendî: (0232) 293 87 15-13
- **Mala Çîrokan a Lîmontepeyê**
  (Limontepe Masal Evi)
  Limontepe Mah. 9708 Sk. No:3
  Karabağlar
  Pêwendî: (0232) 293 97 23

## Wargehên Ciwanan

Di van wargehan de, hemû ciwanên ku temenên wan li dor 15-30yî ne, dikarin ji xizmetên wek; kursên pêşvebirina takekesî, çalakiyên hunerî, xebatên dildarî, semîner, xebatên pirtûkxaneyê û perwerdeya zimanên biyanî bê pere sûdê werbigirin.

- **Wargeha Ciwanan a Havagaziyê**
  (Havagazı Gençlik Yerleşkesi)
  Tarihi Havagazı Fabrikası Gençlik Yerleşkesi Umur Bey Mahallesi Liman Caddesi A/B Blok Fikrimiz/ Fabrikalab İzmir Alsancak/Konak
  İletişim: 0 (232) 293 34 24 / 0 (232) 293 17 21
- **Wargeha Ciwanan a Ornekkoyê**
  (Örnekköy Gençlik Yerleşkesi)
  Zübeyde Hanım Mahallesi Başpehlivan
  Karaali Cad. No:377 Karşıyaka/İzmir
  Pêwendî: 0 (232) 293 16 95



## Platforma Ciwanan a Dîjîtal a Îzmîra Ciwan

Ji bo ciwanên temenê wan di navbera 15 û 30yî de, bi navê **www.gencizmir.com**'ê malperek hatiye avakirin.

Ev qada dijîtal ji bo ciwanan cihê hevnasînê ye. Kurs, aktîvîte û xebatên ciwaniyê yên ku di Wargeha Ciwanan a Havagaziyê de tên amadekirin, li ser vê malperê tên parvekirin. Digel vê yekê, li ser tora civakî kaneleke bi navê Îzmîra Ciwan dê bê avakirin. Bernameyên dîjîtal ên ku dê ciwan, amade û pêşkêş bikin, li ser vê kanalê dê bên belavkirin.

# - Xizmetên ji bo Astengdaran

Li Navendên Xizmetê yên Astengdaran ên Bûca, Konak, Încîraltiyê û Navendên Ferqiyetê yên li Orenkoyê xebatên cuda cuda tên meşandin. Di van navendan de, li gor hevdîtinên bi malbatan re, raporên pêwendîdar û Raporên Lêkolîna Rêberiyê (RAM) perwerde tên dayîn. Di Navenda Xizmetê ya Bûcayê de perwerdeya beriya dibistanê û ya dema dibistanê tê dayîn. Herwiha xizmetên wek perwerdeyên pêşxistina takekesî, rêberiya civakî, aktîvîteyên werzişê, hunerên destan, wêne û drama; cuda cuda tên pêşkêşkirin.



*Penaberên astengdar, ji bo pêdiviyên wesayîdê yên çûnûhatina sazî û dezgehên kamûyê herî kêm du roj berî wê divê daxwazê bikin û bi wî awayî dikarin ji piştgirya wesayîdê îstifade bikin.

- **Navenda Xizmetê ya Astangdaran a Încîraltiyê** (İnciraltı Engelli Hizmet Merkezi)
  Kent Ormanı, Haydar Aliyev Blv., Bakü Cad., 35330 Balçova
  Pêwendî: 0 (232) 293 98 36

- **Navenda Xizmetê ya Astangdaran a Bûcayê** (Buca Engelli Hizmet Merkezi)
  Aydoğdu Mahallesi 1263 Sokak No:1 Evka 1/Buca
  Pêwendî: 0 (232) 293 98 23
  0 (232) 293 98 24

- **Navenda Xizmetê ya Astangdaran a Konakê** (Konak Engelli Hizmet Merkezi)
  Sümer, Milli Kütüphane Cd. No:41, 35260 Konak/İZMİR
  Pêwendî: 0 (232) 293 32 96

- **Navenda Xizmetê ya Astangdaran a Ornekkoyê** (Örnekköy Engelli Farkındalık Merkezi)
  Zübeyde Hanım Mahallesi Başpehlivan Karaali Cad. No:377 Karşıyaka/İZMİR

- **Navenda Ferqiyetê ya Astangdaran a Balçovayê** (Balçova Engelli Farkındalık Merkezi)
  Çetin Emeç Mahallesi, Universiad Caddesi, No:4/40, Olimpiyat Köyü, Balçova/ İZMİR
  İPêwendî: 0 (232) 293 92 14

# - Fêrkirina Pîşeyê

Li Îzmîrê jin, ciwanên bêkar, kargehên ku di sektorên cuda cuda de xebatan dimeşînin, kesên dixwazin di pîşeyên xwe de pêş bikevin, di serî de xwendekarên di beşên teknîkî yên zanîngeh û lîseyan de xwendine, hemû kesên ku 16 salên xwe qedandine dikarin ji perwerdeyê sûdê werbigrin.

Perwerde, ji bo pêşxistina destkariyê û qabiliyeta pîşeyê, bê pere tên dayîn.

**Ji bo hemû kesên ku 16 salên xwe dagirtine:**

- **Ji bo tevlîbûna kursên bisertîfîka, zanîna xwendin û nivîsandina bi zimanê Tirkî (wek belgename) pêwîst e.**
- Ji bo kursên bi belgeya tevlîbûnê (Bêsertîfîka) tu şert ne pêwîst e.
- Ji bo hinek kursan desteka wergêr tê dayîn.

**Navenda Kursê ya Halkapinarê**
(Halkapınar Kurs Merkezi)
Şehitler Caddesi No:138-140/1
Halkapınar/Konak
(Fabrîkaya Arvanan A Berê)
Pêwendî: 0 (232) 293 18 58

# - Midûriyeta Şaxa Edalet û Wekheviya Bajarî

Midûriyeta Edalet û Wekheviya Bajarî li Îzmîrê ji bo li hemberî her cure cudakariyê têbikoşe û ji bo li tevahiya bajêr aştiya civakî pêk were hatiye avakirin. Armanca wê ew e ku edaleta civakî û çanda pêkvejiyanê li nav hemû aliyên civakê belav bibe.

**Maseya Penaberan**
Di bin banê Şaxa Midûriyetê de dixebite; ji bo penaber jî bikaribin ji xizmetên bajarî bi wekhevî sûdê werbigrin, xebatan dimeşîne.

# - Xizmetên Rewşa Lezgîn

Di bin banê Midûriyeta Şaxa Midaxeleya Lezgîn û Şewatê ya Serokatiya Daîreya Agirkujiyê de ye. Di vê beşê de midaxele li şewatên mal, maşîne, kargehan û şewatên qadên girtî (tunel, hwd.), lehî, bûyerên xwekujiyê, şewatên avahiyên pirqatî û balexaniyan tê kirin û ji bo rewşên ku fikara şewatê tê de heye wek tevdîr xizmetên refaqetê tên dayîn.

Midûriyeta Agirkujî, Lêgerîn, Xilaskirin û Karên Afatê; lêgerîn û rizgarkirina li bajêr (erdhej, hezaz), lêgerîn û rizgarkirina li çiya û xwezayê, lêgerîn û rizgarkirina li ser û binê avê û xebatên rizgarkirina heywanan dike; midaxeleleyê li qezayên trafîkê, ketina bîrê, mehsûrmayîna di esansorê de, şemitandina li ser axê û bûyerên KBRN (Kîmyewî, Biyolojîk, Radyolojîk, Nukleerî)  dike û bi bota deryayê û maşîneya AKS'ê (Lêgerîn, Rizgarkirin û Tenduristî) ji bo tevdîrê xizmetên refaqetê dide.

Hûn dikarin bi rêya nimreyên **Navenda Banga Lezgîn ên 112 û 110'ê** bê pere xwe bigihînin van xizmetan.

# - Xizmetên Tenduristiya Civakî

## Jiyana Tendurist û Xizmetên Lênêrîna li Malê

Kesên li navçeyên navendî yên Îzmîrê îqame dikin û pêdiviya wan bi desteka lênêrînê hebe, ew bi xwe an jî bi navgîniya muxtarê taxê dikarin serî ji bo vê xizmetê lê bidin. Herwiha dikarin ji xizmetên wek paqijiya malê, lênêrîna takekesî, desteka derûniyê, perwerdeya tedawiya fizîkî û xizmetên pansûmana birînan bê pere sûdê werbigirin.

**Navnîşan:** Aydoğdu Mahallesi 1263 Sokak No:1E Buca/İZMİR

(Kampusa Jiyanê ya Civakî)

Telefon: 0 (232) 293 18 70 - 71

# - Xebatên Werzîş û Ciwaniyê

Klûba Werzîş û Ciwaniyê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê, ji bo gelek zarok, ciwan û mezinan derfeta werzîşê pêşkêş dike.



**Di derbarê eywanên werzîşê û kursan de ji navnîşan û telefonên jêr hûn dikarin agahiyên berfireh werbigirin:**

**Navend:**

- **Komeleya Klûba Werziş û Ciwanan a Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê (İzmir Büyükşehir Belediyesi Gençlik ve Spor Kulübü Derneği)**
  Celal Atik Sports Hall, Kültürpark/İZMİR
  Tel: 0 (232) 425 04 21 / 0 (232) 446 26 15
- **Kortên Tenîsê yên Bostanliyê:** 0 (232) 293 95 17
- **Eywana Werzîşên li ser Qeşayê ya Bornovayê, ji bo qeyda kursê:** 0 (232) 293 42 12
- **Kampusa Jiyana Civakî ya Bûcayê:** 0 (232) 293 98 10
- **Sehaya Atletîzmê ya Seha Aksoyê:** 0 (232) 425 04 21 – 425 04 42 (Girêdayî Midûriyeta Werzîş û Ciwanan a Bajêr e)
- **Tesîsa Werzîşê ya Sehaya Xalî ya Yeşîlyûrtê:** 0 (232) 228 75 75
- **Eywana Werzîşê ya Pirarmancî ya Can Çagnayê ya Ûzûndereyê:** 0 (232) 226 78 43
- **Tesîsên Werzîşê yên Încîraltiyê:** 0 (232) 278 06 00
- **Qada Fûarê ya Kulturparkê:** 0 (232) 425 08 25
- **Evka-4 Eywana Werzîşê ya Naîm Suleymanoglûyê:** 0 (232) 351 38 66
- **Sehaya Xalî ya Taxa Çîçekê:** 0 (232) 345 87 47

## Qada Rekreasyonê ya Aşık Veyselê

Nava hefteyê xizmetên seansa gel: 13:00-13.45 / 14:00-14:45, Dawiya Hefteyê Xizmetên seansa gel rojên Şemî û Yekşemê di nava van saetan de pêk tên: 13:00-13:45 /14:00-14:45 / 15:00-15:45

**Kesên ji 18 salî pêçûk bin di dema serîlêdanê de pêwîst e ku dayîk an jî bavê wan bi wan re bin.**

**Ji bo agahiyên berfireh:**
Kızılay Mah. Buz Sporları Salonu, 506. Sk. No:1, 35030
Bornova/İZMİR
0232 293 4212 û 0232 293 31 03

# - Pirtûkxane

Li 2 pirtûkxaneyên gerok ên Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê û li pirtûkxaneyên li cihên cuda yên bajêr kesên bixwazin dikarin pirtûkan bixwînin, lêkolînan bikin û di derheqê dîroka bajêr de agahiyan bistînin. Di pirtûkxaneyan de înternet bê pere ye. Kesên bixwazin pirtûkan bigrin, divê endamtiya wan hebe, ji bo endamtiyê jî divê li bajarê Îzmîrê îqameya wan hebe.

- **Pirtûkxaneya Bajêr a Îzmîrê:**
  (İzmir Kent Kütüphanesi)
  Atatürk Cad. No: 454 - Alsancak
  (Li Hember Gara Alsancakê)
  Tel: 0 (232) 293 11 51
  Fax: 0 (232) 293 39 52
  E-posta: kutuphane@izmir.bel.tr
  Saetên Xebatê: Rojên nava hefteyê, di nava van saetan de: 08.00-22.00

- **Pirtûkxaneya Şatoyê**
  (Şato Kütüphanesi)
  Yeşiltepe Mah. Halil Rıfat Paşa Cad.
  No:37 Konak/İZMİR
  https://satokutuphanesi.izmir.bel.tr/home
  Tel: 0 (232) 293 10 20

- **Pirtûkxaneya Lêkolînê ya Wargeha Ciwanan a Havagaziyê** (Havagazı Gençlik Yerleşkesi Araştırma Kütüphanesi)
  Tarihi Havagazı Fabrikası Gençlik Yerleşkesi Umur Bey Mahallesi Liman Caddesi A/B Blok İzmir Alsancak/Konak
  Tel: 0 (232) 293 95 42

- **Pirtûkxaneya Bûcayê**
  (Buca Kütüphanesi)
  Ufuk Mah. 916 Sk. No:31/1 Buca
  Tel: 0 (232) 293 11 49
  E-posta: bucakutuphanesi izmir.bel.tr
  Saetên Xebatê: Rojên nava hefteyê, di nava saetên 08.00-18.00an de.

- **Pirtûkxaneya Guzelbahçeyê**
  (Güzelbahçe Kütüphanesi)
  Yıldız Sk. No: 31/1 Güzelbahçe
  Tel: 0 (232) 293 11 53
  E-posta: guzelbahcekutuphanesi izmir.bel.tr
  Saetên Xebatê: Rojên nava hefteyê, di nava saetên 08.00-18.00an de.

## APİKAM (Muze û Arşîva Bajêr a Ahmet Pîrîştînayê)

Muze û Arşîva Bajêr a Ahmet Pîrîştînayê, xizmetê dide hemşeriyên ku dixwazin di derheqê dîroka Îzmîrê de lêkolîn û lêgerînê bikin. Di agahîdanka arşîva bajêr de gelek daneyên dîrokî hene ku mirov dikare bi awayekî dîjîtal jê sûdê werbigre. Digel xizmetên arşîvê, xebatên pêşenayên mayînde û demkî yên di derbarê dîroka Îzmîrê de jî tên meşandin. Mala Bîranîna Koçberî û Mibadeleyê ya li navçeya Bûcayê, li gor vê yekê, wek pêşaneyek hatiye avakirin.

- **Ahmet Piriştina Kent Arşivi ve Müzesi (APİKAM)**
  Şair Eşref Bulvarı No:1/A Çankaya/İZMİR
  Tel: 0 (232) 293 39 00-01-02
  www.apikam.org.tr

- **Mala Bîranînê ya Koçberî û Mibadeleyê**
  (Göç ve Mübadele Anı Evi)
  Menderes, 132. Sk. 41 B, 35370 Buca/İZMİR

# - Xizmetên Çand û Hunerê

Kesên bixwazin, dikarin bê pere tevlî kursên Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê bibin. Hûn dikarin li ser telefonên ku li jêr hatine nivîsandin agahiyên berfireh bistînin:

- Ji bo Koma Dans û Rîtmê (temen 9-25), Koroya Muzîka Hunerî ya Tirk (temen 18-50) Koroya Muzîka Gel a Tirk (temen 18-50), Koroya Zarokan a Pirdengî (temen 18-14), Kursa Baleyê (temen 5-10), Hip Hop, Dansa Modern, Perwerdeya Flemenko û Tangoyê (temen 7 û jê mezintir): 0232 293 34 79

- Ji bo Orkestraya Taxê (temen 8-17), Perwerdeya Piyanoyê (temen 5-14), Perwerdeya Perkusyonê (temen 7 û jê mezintir) 0232 293 40 42

- Ji bo Perwerdeya Hêza Xeyalê ya Kolektîf û Pevrebûna Muzîkê (temen 7 û jê mezintir) 0232 293 34 36

# - Xizmetên Cenazeyan

Dema ku mirovek wefat dike ji nexweşxaneyê, heke li malê wefat kiribe, ji tenduristxaneyekê an jî ji bijîşkiya şaredariya navçeyê rapora mirinê dikare bê stendin. Telefonî “**188”ê (ALO 188)** ya Xizmetên Cenazeyan ên Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê tê kirin û agahiya mirinê tê dayîn. Ji bo cenaze, ji aliyê Xizmetên Cenazeyan ve maşîne tê amadekirin.

Heke rewşa malbatê ya aborî ne guncav be, bi devkî rewşa xwe diyar dike, wê demê hemû karûbarên definkirinê ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Îzmîrê ve bê pere tên kirin.

# - Xizmetên Dermankirinê û Têkoşîna bi Kurmûkêzan re

